

مزكين

العدد ١٢٦ - ٢٠٢١/١٢/١٥



النظام البيئي

مزكين
صديقة البيئة



الأدب العربي

الأسد والفأر



حقيبة مزكين

الطيور



المواقع الأثرية

قلمة جعبر

إعداد: عامر فرسو * رسومات: خالد بيجو و عبد الرحمن خليل * تصميم: رامي مسور و بيريفان العمر * ترجمة: سريست عته

مجلة للأطفال تصدر عن مؤسسة رونا هي



Dêrazorê

Mizgîn: Hevalno, werin em bi hev re bajarê Dêrazorê nas bikin, da em carekê serdana wê bikin.

Nadiya: Xwezî em niha biçûbana Mizgîn.

Aras: Ew bajar ji vir dûr e Nadiya, li nêzî çemê Firatê ye.

Corc: Raşt e hevalno, Dêrezorê yek ji bajarên li rojhilatê Sûriyê ye û 250 km. li başûrê Qamişlo ye.

Cûliya: Bajarekî pir xweş e. Çemê Firatê bajêr dike du beş, lê kî dizane ka wateya navê wê çi ye?

Rai'd: Ez dizanim. Ji ber ku berê darên hinan li wê herêmê pir bûn, destpêkê digotin 'warê hinan'. Lê pişt re bû Dêrezorê; 'dêr' ango kenîse û 'zor' jî tê wateya erdê nizim yê li teniştê çem.

Mizgîn: Hevalno, derbarê bajêr de va me gelek agahî girtin, lê şênîyên wî kî ne?

Nadiya: Ez dizanim. Li Dêrazorê Ereb, Kurd û Ermen bi hev re di nava aştî û aramiyê de dijîn.

Corc lê zêde dike û dibêje, -herwiha li herêmê gelek bajar û ciyên dîrokî yên şariştaniyên berê jî hene. Hevalên Mizgîn pir kêfxweş bûn ku derbarê bajarê Dêrazorê de pir agahî girtine û gotin, em di betlaneyê de serdana wê bikin û gelek wêneyan lê bikişînin.



تقول **مزكين** لأصدقائها تعالوا معي نتعرف على مدينة الزور لكي نزورها معاً في المستقبل.

ناديا بفرح: ليتنا نزورها الآن يا مزكين.

فيقول آراس هي بعيدة تقع على نهر الفرات وتبعد عن مدينتنا قامشلو كثيراً

فيصفق **جورج** قائلاً: نعم تبعد أكثر من ٢٥٠ كيلو متراً، هي قريبة من حدود العراق.

فتضيف **جوليا** بفرح: ما أجملها من مدينة فنهر الفرات يعبرها وتزيدها جمالاً، ولكن يا اصدقائي من منكم يخبرنا عن معنى اسمها؟

رائد يقفز من مكانه بثقة: أنا.... أنا

يضحك الجميع بفرح: إذا أخبرنا يا رائد.

يرد **رائد** وهو يرفع يديه عالياً: لكثرة أشجار الرمان فيها قالوا عنها دير الرمان بداية، ولكن فيما بعد ذكروا بأن أصل أسمها مركب من «دير» وهو مكان عبادة الرهبان.

فيقول **آراس** و«الزور» ماذا تعني يا صديقي؟

يرد **رائد** مزهواً بنفسه: الزور هي الأرض المنخفضة على طرفي مجرى النهر

مزكين: يا اصدقائي ها قد عرفنا الكثير عن مدينة دير الزور ولكن من هم سكانها؟

فترد **ناديا:** يسكن المدينة العرب والكرد والسريان بونام وسلام.

يضيف **جورج:** وفيها الكثير من الآثار الجميلة للحضارات القديمة وحينما نزورها سنلتقط هناك أجمل الصور للذكرى.



الطیور

هناك ثمانية آلاف وستمئة نوع من الطيور، تتفاوت حجمًا، من الطائر الطنان أصغرها، إلى النعامة أضخمها. والطيور متباينة الألوان، والأصوات، والبيئات، وأصناف الغذاء، لكن تجمعها خصائص كثيرة متماثلة، فمثلًا الطيور كلها مَكْسُوَّة بالريش، والطيور جميعها، لها أجنحة للطيران، ولكل طائر منقار يلتقط به غذاءه، والطيور جميعها تبيض وتكاثر بالبيوض.

BALINDE

Di xwezayê de 8 hezar û 600 cureyên balindeyan hene. Gewdeyên wan jî hin mîna çûka beytikê piçûk in, hin mîna hêştirme mezin in. Ji aliyê reng, deng û xwerek ve jî ji hev cuda ne. Lê tevî van cudaiyan, taybetiyên wan yên sereke havbeş in. Tevayiya teyrikan biperîk in û baskên wan hene. Bi wan baskan difirin. Di heman demê de ji bo xwarinê jî nikilê xwe bi kar tînin. Ji bilî şevşevokê tev jî hêkan dikin.





Mizgîn
Dosta Xwezayê ye
صديقة البيئة

مزكين تعرف أصدقائها الأطفال
على النظام البيئي، وترسم معهم
مكوناتها بالألوان الجميلة

**Em bi hev re
pêkhateyên jîngehê
nas bikin û wan bi
rengên cuda bedew
bikin**

Pergala (sîstem, nîzam)
jîngehê û têkiliyên di
nava pêkhateyên wê de

الكائنات الحية والعناصر الغير
الحية كافة في محيط بيئي،
وكيفية تفاعلها فيما بينها

النظام البيئي

**sîstema
jîngehê**


عناصر حية

Heyberên zindî



عناصر غير حية

Heyberên ne zindî





Mizgîn
Bîîşka Malbatê
طبيبة العائلة



مزكين تقول لأصدقائها الأطفال

Mizgîn ji hevalên xwe re dibêje

Xwarina baş tendurîştîya
mirovan jî baş dike.



Ji ber wê pêdiviya bedena mirovan
bi van madeyên sereke heye.

- Av
- Nişa
- Proteîn
- Rûn
- Vîtamîn
- Maden

(التغذية الجيدة هي أساس الصحة الجيدة)

والإنسان يحتاج إلى مجموعة من
المغذيات الأساسية:

- الماء
- النشويات
- البروتينات
- الدهون
- الفيتامينات
- المعادن






مزگین تەرف ٲصڊقائها عاس ٲسماء بعض القرطاسية بلفاتهم الجميلة

Mizgîn hevalên xwe bi zimanên wan
fêrî navên pêdiviyên dibistanê dike



القلم
Pênûs
قلم
Pen




المسطرة
Rastkêş
مصحف و سدا
Ruler



الدفتري
Lênûs
دفتر
Notebook



الممحاة
Jêbir
محسدا
Eraser



الألوان
Reng
رعتا
Colors



قلم الرصاص
Pênûsa Risasî
قلم و احدا
Pencil



Ceribandina ava livdar

Alavên pêwîst:

- Kilêniks
- Du piyaleyên (qedeh) plastîk
- Dermanê rengîn yê xwarinê
- Av


Qonaxên ceribandinê:

1 Emê hinek avê berdin piyaleyekê. Pişt re emê dermanê rengîn li avê zêde bikin.

2 Emê kilêniksê bi awayê dirêjkî li hev bipêçin. Pişt re emê aliyekî wê bixin nava piyaleya tijî av, aliyê din bixin nava piyaleya vala.

3 Emê çend deqîqeyan piyaleyan wilo bihêlin û li bendê bimînin ka wê çi bibe.

10



Encam û şîrove

Emê bibînin ku av bi riya kilêniksê ji piyaleyekê diherike piyaleya din.

Çima û çawa?

Lewra ava di hundirê kilêniksê de li dijî hêza kişandinê ya erdê dilive û ji piyaleyekê ber bi ya din ve diçe.

الأسد والفأر



كان الأسد يتجول في الغابة، فوجد فأراً، وقع في حفرة، ولا يستطيع الخروج منها، فلما شاهد الفأر الأسد؛ توسل إليه ليساعده. وأخذ في البكاء قائلاً: أرجوك أيها الأسد الطيب، أخرجني من هنا، ولن أنسى لك هذا الجميل، الأسد عطف على الفأر المسكين، فمد يده الطويلة القوية إلى داخل الحفرة، فتسلقها الفأر، وخرج فرحاً من الحفرة. شكر الفأر الصغير الأسد القوي لمساعدته، وقال له: ربما يأتي يوم أساعدك فيه، كما ساعدتني؛ ضحك الأسد القوي في استهتار، وقال للفأر: لا يمكن أن أحتاج إلى مساعدتك؛ أنت صغير جداً، ومن الصعب أن أحتاج إليك. في أحد الأيام، كان الفأر، يلعب في الغابة، فسمع صوت زئير الأسد عالياً، مثل رعد السماء، وكان يستغيث، ويطلب النجدة: (ساعدوني، ساعدوني).

ذهب الفأر حيث صوت الأسد، فوجد الأسد واقفاً في شبكة الصياد، ولا يستطيع الخروج منها.

قال الأسد للفأر: هل يمكنك أن تساعدني؛ قبل أن يأتي الصياد؟ قال له الفأر: لا تقلق، إن هذا شيء سهل، وسهل جداً، فأقبل الفأر إلى الشبكة، وأخذ يمزق الحبال بأسنانه الحادة، حتى استطاع أن يخلص الأسد القوي.

خرج الأسد من الشبكة، وهو سعيد، فقال للفأر: أنا أشكرك؛ لأنك أنقذتني، لقد كنت أستهيئ بك من قبل، لكنني كنت مخطئاً.

وهكذا صار الأسد والفأر أصدقاء.





Hêz di yekîtiyê de ye

Çar zarokên cotkarekî hene. Zarokên wî li hev nakin.
Gotkar ji wan re wiha dibêje:

- Ji hev hes bikin û alîkariya hev bikin!

Lê zarok guh nadin van şîretan

Cotkar rojekê gazî zarokên xwe dike û ji wan re wiha dibêje:

- Ka deh şivikan ji min re bînin!

Zarok deh şivikan jê re tînin datînin ber destê wî. Cotkar wan şivikan bi hev ve girê dide. Pişt re yek bi yek dide destê wan û wiha dibêje:

- De ka bişkînin!

Zarok hewl didin wê desteya şivikan bişkînin. Lê dikin nakin nikarin bişkînin. Cotkar desteya şivikan vedike. Şivikan yek bi yek dide destê wan. Vê carê zarok bi hêsanî şivikan dişkînin. Li ser vê yekê cotkar ji zarokên xwe re wiha dibêje:

- Va hûn dibînin, yên ku dibin yek xurt dibin. Hûnê kitekit zû bikevin. Eger hûn bibin yek, hûnê pirtir serfiraz bin.





مزگین مع أصدقائها آراس -
ناديا - رائد - جوليا - جورج

Mizgîn û hevalên wê Aras-
Nadya-Raid-Cûlya-Corc





نارين نذير حسين



قبل سنتين و هي في العاشرة من العمر شاركت نارين في حملة (بدي بسكليت) بمدينة عامودا، و حازت على المركز الثالث، و مؤخراً في هذه السنة بمدينة قامشلو شاركت بمسابقة المهرجان الرياضي الأول باسم (الشهيد باران مawa) و نالت كأس و ميدالية المركز الأول، و تتمنى لو تحصل على بسكليت خاص بها لأجل التمرينات.

تقول نارين: بأن شعور الفوز جميل و أرغب مشاركة أصدقائي هذا الفوز عبر مجلة مزكين الجميلة و أهدي فوزي هذا إلى أمي و أبي وجميع الأصدقاء الذين شجعوني، و اتمنى في المستقبل أن أكون رياضية و أحقق الفوز في سباق البسكليت الذي أحبه جداً.

Narîn Nezîr Hûsên

Hevala me Narîn 12 salî ye û xwedekareke pir jîr e. Herwiha ji ajotina piskilêtan jî pir hes dike. Beşdarî pêngava `Ez biskilêtekê dixwazim` bû. Berî du salan jî li Amûdê tevî pêşpirka biskilêtan bû û pileya sisiyan bi deşt xist. Di dema dawî de jî beşdarî Festîvala Ş. Baran Mawa ya li Qamişlo bû û pileya yekê bi serkeftin bi deşt xist.

Narîn wiha dibêje: “Hestê serkeftinê pir xweş e. Ez bi riya kovara Mizgîn vê serkeftinê diyarî Dêbav û hevalên xwe dikim. Herwisa kesên piştgirî dayîn min, pir spasiya wan jî dikim.

Narîn dixweze di demên pêş de bibe werzişvaneke serkeftî û bi hêvî ye biskilêteke wê ya taybet çêbe.





أمدقائي الأطفال تعرفوا على حقوقكم عبر حلقات متتالية مع صديقتكم مزيكين

**Hevalên zarok, bi riya xelekên hevala xwe
Mizgîn yên li dû hev mafên xwe nas bikin**



٢. عدم التمييز

الأطفال جميعهم، يمتلكون هذه الحقوق، بصرف النظر عنّهم، أو أين يعيشون؟ أو أيّ لغة يتكلّمون، أو ما دينهم؟ أو ما أفكارهم وأشكالهم؟، ما إذا كانوا أولاداً أو بناتٍ، أو إذا كانوا ذوا إعاقة، أو أغنياء أو فقراء، وبصرف النظر عنّ يكون آباؤهم أو أسرهم وأفكارهم ومعتقداتهم أو ماذا يعملون؟ ولا يجوز معاملة أيّ طفل معاملة غير عادلة، لأيّ سبب من الأسباب.

2.Wekhevî

Cudayî û rengîniya di nava me zarokan de ti caran nabin asteng ku mafên me ne weke hev bin. Ango nabe ku mafên zarokekî ji mafên zarokekî din pirtir bin. Ango zarok li kîjan cihê bijî û bi kîjan zimanî biaxive, baweriya wî bi çi ol û fikrê bê, çi kur çi keç be, çi dewlemend çi xizan be, bi tevayiya zarokên din re wekhev e û xwediye heman mafan e. Ji ber wê nabe ku danûstandina me zarokan bi hev re li ser bingehe newekhevî û bêdadiyê be.



Keleha Ceî`ber

Cûliya: Werin em behsa Keleha Ceî`berê bikin. Hefteya borî me bi malbatî serdana wê kir.

Aras: Erê, keleheke pir bedew e, min wêneyên wê di TV de dîtine.

Cûliya: Raşt e, keleh li nêzî bajarê Tebqa ye û dikeve kêleka çepê ya çemê Firatê. Li wêneyê min binêrin, ez ber bi deryaçeya bendavê çêkirî ve dibezim.

Ra`id: Dîmenekî pir balkêş e, keleh di nava avê de weke giravekê xuya dike.

Mizgînê ji hevalên xwe re got, ezê wêneyê kelehê li ser kaxizê xêz bikim.

Corc: Erê hevalno, gelo kî wateya navê wê dizane?

Cûliya: Min tabloyek li ser deriyê kelehê dît, nivîsîbû; “Di dîrokê de, du nav li vê kelehê hatine kirin. Berî hatina Islamê bi navê EL-Doseriya dihat naskirin. Lê piştî Islamê û heta niha bi navê Ceî`ber tê naskirin)

Mizgînê tabloya kelehê bilind kir û got, hevalno, min jî saz kirin wêneyê kelehê qedand.

Zarok tev kêfxweş dibin û jê re li çepikan didin.

قلعة جبر

جوليا: تعالوا يا أصدقائي أحدث لكم عن قلعة جبر؛ لقد زرتها في عطلة الأسبوع مع أهل.

يضيف آراس: قد شاهدت صورها في التلفزيون ما أجملها؟!

جوليا: نعم تقع على ضفة نهر الفرات اليسرى وهي الآن تطل على البحيرة التي شكلتها سد الفرات؛ انظروا إلى هذه الصورة وأنا أركض باتجاه القلعة.

رائد: يا للروعة يا أصدقائي.. إنها تبدو كجزيرة صغيرة وسط الماء!

تحمل **مزكين** ورقة وتبدأ برسم القلعة كما هي في الصورة فيصفق لها أصدقائها.

ويسأل **جورج:** ولكن من يعرف معنى اسمها؟
فترد **جوليا:** قرأت هناك لوحة تعريفية مكتوب عليها: (حملت القلعة عدة أسماء من أهمها اسمان: - الدوسرية في الفترة ما قبل الإسلام. - جبر في القرن الحادي عشر الميلادي، حيث تنسب القلعة إلى جبر بن سابق القشيري). فتسأل ناديا: ولكن يا أصدقائي من كان يسكن ويحكم القلعة؟ فتقول **جوليا:** وهذه المعلومة كذلك كانت مكتوبة فيقال أن من أشهر حكامها هو الملك الحافظ نور الدين أرسلان شاه الذي ملكها قرابة اثنين وأربعين عاماً في عهد الدولة الأيوبية.

ترفع **مزكين** لوحها فرحة وتقول: وها أنا انتهيت من رسم القلعة، فيصفق لها الأصدقاء بسرور.






Ceribandina Jîriyê



	=	5	-	6
+		-		+
2	=		+	
=		=		=
	=	2	-	9




Qonaxên wêneyê Kûçik





Mizgîn
û Wênêkêşî
لقطة مزكين



Gundê Selam
Dirbêsiyê - Îlon-2021

Wênêkêş
Olva Hec Mensûr




قرية السلام
الدرباسية - ايلول ٢٠٢١





MIZGÎN

Kovara zarokan ji hêla saziya Ronahî ve tê derxistin



Hêz di yekitiyê de ye * Balinde *
Ava livdar